


Para Kurdan di
kabîneya Rûhanî de

»»» R:7



Terorîstek
kêmtir

»»» R:2



Gelo destwerdana
Tirkiyê ya di Lîbyayê
de, wê bibe sedema
piştgiya Ewropî-
Erebî ji bo pirsê kurdî
li Sûriyê

»»» R:5



Îran piştî
kuştina
Qasim
Silêmanî

»»» R:6



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (365) 06-01-2020 Buha (1000) Tûmen

Dawî Nêzîk e

1 3'ê Befranbara 1398'an bû rojê dîrokî bo azadîxwazên Îranê û dever, û rizgarîxwazên Kurd ji destê faşîzmê. Di êrîşêke pîlandarêti de Qasim Silêmaniyê terorîst ê Îranê ku cinayet û rola wî di derheq nearamkirina deverê de ji kesên wekî "Bin Ladin" û "Ebûbekir Bexdadî" kêmtir nebû, tevî Ebû Mehdî Muhendis ji aliyê hêzên Amerîkayê ve hatine kuştin.

Ew bûyerane di heyamaeke kêr de wekî bombekê di nav medyayên cihanê de teqiya, û bi vî awayî ew bûyer bû dawîya piropagandeya rejîmê. Di salên desrbazbûyî de, kêr roj hebûn ku medyayên cihanê basa rola pasdar Qasim Silêmanî yê terorîst nekin, ku bi berdewamî mijûlî pîlandarêji bo kuştina xelkê bêtawan bû.

Çend sal berî niha, medyayên rejîmê û nemaze torên civakî ên girêdayî Spahê rû li Amerîkayê digotin: "Dibe hûn Batman û Sûpermen û Spaydêrmenên xwe bînin da ku bikarin xwe ji destê Silêmanî xilas bikin", lê îro rojê me dît, ku şikandina meznahiya xeyalî û diwîn a rejîmê hewcehî bi Bat-



men û Sûpermenan tunebû!

Silêmanî li bal pasdarên terorîst yê rejîmê û ji hemûyan sertir Elî Xamineyî wekî Sembol û Ostûreyekî dihate mêzêkirin, û tê dîtin ku îro rojê hemûyan destê xembariyê danîne ser hev. Di deh selên derbasbûyî de, Silêmanî yek ji wan kartên givaşê bû ku Xamineyî li dijî Rojava mifah jê wergirt; kesek ku berpirsê raasteraşt ê zêdekirina nifûza rejîmê li deverê û kûrahiya ştratiya Komara Îslamî bû, û gelek caran wekî kabûsên dujmanan dianîne ser ziman.

Niha bi kuştin û nemana Silêmanî, yek ji fermanên Spaha terorîst a Komara axûndî ji kîsê wan çûye, ku di wan salan de pira pêwendî û nêzîkkirina deste û girûpên terorîstî yê deverê û girêdana wan bi Cemarane bû; yan jî bi wateyeke din nemana Silêmanî dikare pêwendiyên dînamîkî yê wan girûpan ji hev hilweşîne, û eve jî bi wateya kurtbûna desthilata rejîmê di deverê de.

Pirojeyeke din a rejîmê ku bi kuştina Silêmanî raştî şikestê yan aliyê kêr paşvemanê hat, pirograma zêdetir nearamkirina deverê bû, ku di rojên derbasbûyî de bi awayekî berçav dihate dîtin ku Qasim Silêmanî ji rêya Heşda Şe'ibî ve çawa balyozxaneya Amerîkayê dorpêç dikir. Qasim Silêmanî toreke berfireh a terorîstî di deverê de afirandibû ku piraniya avaker û saziyên dewletî di destên wî de bûn; her ji şaredariyan ve bigre heya digihe Ewqaf û Hevya Sor û Hêza Quds, Wezareta Bergirî, Dezgeha Dîplomatî ya rejîmê û...hwd, ku bi vî sedemê gelek hêsan çek û cebîrxane didane terorîstên deverê û armancên demkurt û demdirêj ên rejîmê pê dibire serê, lê niha pirojeya "Hîlala Şî'e" bi kiryar raştî ji hev veqetiyaneke dijwar hatiye.

Niha rejîmê du rê li pêş in, yan dibe bêhelwest bimîne, yan jî bêdengiyê hîlbijêre, hekî bêdeng be û ti karekî neke, eva bal gelên deverê nifûza hizrî a rejîmê namîne, û her wek navxweya Îranê, tu rewatiyek jê re namîne, hekî dijkiyarê jî nîşan bide û bixwaze tolê biştîne, eva digel bertekên gelek dijwar ên navnetewî rûbirû dibe, ku kontirolkirina wê gelek dijwar dibe, yan aliyê kêr di destê Komara Îslamî de nabe, eva jî bi kurtî dibêje me, ku "Dawî nêzîk e"!

Sergotar

Terorîstek kêmtir

N: Kerîm Perwîzî

Dawî rojên sala 2019-an bona ji rê derxiştina meşên xelkê bêzarbûyî ê Îraqê li dijî destêwerdanên Îranê hêzên milîş ên nêzîkî rejîma Îranê û girûpên destçêkirî ên vê rejîmê êrîş kirin ser balyozxaneyên Amerîka li Bexdayê û hinek cih şewitandin.

Di yekem demên roja sêyem ya sala nû de li Bexdayê balafireke bêbalafirvan a Amerîkayî êrîş kire ser darêjerê êrîşa li ser balyozxaneyên Amerîkayê û ew digel hemû kesên derdora wî kuştin.

Di vê êrîşê de Qasim Silêmanî ku fermanî Hêza Quds a terorîst a ser bi Spaha Pasdaran a Komara Îslamî bû, hate kuştin. Qasim Silêmanî di warê leşkerî de fermanî yek ji çiqên Spaha Pasdaran a terorîstî bû, lê di warê piraktîkê de kesê duyê ê rejîmê piştî Xamineyî bû, jiber ku stratejiya siyasî û aborî û reftara Komara Îslamî ji aliyê Xamineyî ve bi Qasim Silêmanî hatibû spartin, û kuştina Qasim Silêmanî cuda ji hemû peyaman û sedemên din, ew peyama rohn bo Komara Îslamî bû, ku tenê yek qonax maye ku ew jî kuştina Xamineyî ye!! Lewra nameyeke rohn û eşkere ye ku yan stûxwarê cihanê dibe yan rejîma wê tê jinavbirin.

Piştî jinavbirina Qasim Silêmanî fermanî terorîstên ser bi Komara Îslamî, rejîma Tehranê li duriyekê de asê bûye, gelo bersivê bide, û herwekî nûnerê wan di NY de got, bersiva kiriyara leşkerî bi kiriyareke leşkerî bidin, yan bi awayekî din besîcî û pasdaran razî bikin?

Hekî bi êrîşa leşkerî li ser Amerîkayîyan bersiv bidin,

Peyama pîrozbahiya Mîstefa Hicrî bo Kosret Resûl



Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ di peyamekê de pîrozbahî li “Kosret Resûl”, Serokê Encûmena Bilind a Siyasî a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Rêzdar “Kosret Resûl”, Serokê Encûmena Bilind a Siyasî a Yekîtiyê

Tevî silavekî birayane

Em bi boneya hîlbijartina te wekî Serokê Encûmena Bilind ya Siyasî ya Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê, herwisa serketina kongereya çarem a Yekîtiyê, pîrozbahiyê pêşkêşê we tekoşeran û yek bi yek endamên Encûmena Bilind a Siyasî û Encûmena Giştî ya Serkirdatî ya hîlbijartiya kongereyê dîkin.

Hêvîdarim rêberatiya nû ji rêya yekîti û yekgirtina aliyên siyasî yên Başûrê Kurdistanê, û xizmetkirin bi armancên bilind ên Kurd di hemû beşekê de, erkên nîştimaniyên xwe bi serkevtinê birêve bibin.

Digel rêzeke dûbare
Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê
Lêpirsyarê Giştî
Mîstefa Hicrî
7`ê Befranaba 1398`an
28`ê Kanûna Pêşîna 2019`an

dijkiriyara piştî wê nahê pêşbînîkirin, herwek Tramp ragehandiye ku ewê li 52 cihên girîng ên Îranê bidin, renga yek ji wan ciyan Ceyran be, yan kar bigihîje şerê tewaw ku êdî tu şûnwarek ji Komara Îslamî li ser erdê namîne.

Lewra niha gefên zaf dixwin, ku bikarin alîgirên xwe razî bikin, lê bixwe dizanin ku her şaşiyek şaşiya mirinê ye.

Bo her azadîxwazekî nemana terorîstan cihê kêfxweşiyê ye, û hindî ku terorîst kêmtir bin cihan ber bi aştiyê û avedaniyeke zêdetir ve pêngavan davêje, lê bo Kurd û Kurdistanê jinavçûna fermanî Spaha Quds a terorîstî gellek cihê dilxweşiyê ye, jiber ku Spaha Pasdaran a rejîma Îranê hertim serkuta herî bihêz di Kurdistanê de li dijî Kurdan bi kar aniye, û herweha Spaha Quds berpirsê terorkirina rêberên PDKÎ û Kurd li dervey welat bûye, û Spaha Quds emrazê terorkirina rêberên Kurd Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî bûye. Di serdema berpirsariya Qasim Silêmanî de jî, tawan û cinayetên Spaha Quds li dijî Kurd û Kurdistanê zêdetir û zêdetir bûne, û heta bas ji vê yekê jî di hate kirin ku di hemaseya Kosalanê de Qasim Silêmanî bixwe çûye Sewlawayê û ferman daye ku bi çekên fosfor ên qedexekirî li pêşmergeyên PDKÎ bidin.

Lê kuştina fermanî terorîst dawîya kar nîne, û ew rejîma her di bingeha xwe de û di tewahiya xwe de sistemeke terorîstî û terorîstperwer e. Terorîstek kêmtir dibe û keseke tawanbar di cihê wî de dadinên. Demekê cihan û navçe aramiyê bi xwe ve dibîne, ku çavkaniya terorîzmê wate rejîma zal li Tehranê bê hişikkirin û ji nav here.

Navenda Hevkariyê şanoya hilbijartinên Îranê baykot kir

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê di daxuyaniyekê de şanoya hilbijartina nûnerên meclîsa rejîmê baykot kir.

Daxuyanî wiha ye:

Daxuyaniya Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê derbarê baykota şanoya hilbijartina nûnerên meclîsê li Îranê

Welatîyên hêja!

Xelkê mafxwaz ê Kurdistanê!

Rejîma Îslamî a Îranê piştî danîna hin mercan û pêkanîna aştengiyan ji bo berendamên nûneratiya Meclîsa Şûraya Îslamî, dixwaze di demeke nêzîk de şanogeriya hilbijartinan birêve bibe.

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê di vê baweriyê de ye ku Meclîsa Şûraya Îslamî ji destpêka temenê Komara Îslamî a Îranê ve ti carana bi naveroka xwe meclîseke raştîn nebûye. Herwisa nikare di pirsên girîng ên Îranê de biryarê biştîne û bi bador be. Lê belê ev meclîs bixwe beşeke girîng ji vê rejîmê ye û rola wê weke organên tepisandinê ên rejîmê ye. Tevî van raştiyan, niha bi taybet piştî xwepêşandanên nerazîtiyê ên vê dawiyê li Îran û Kurdistanê ên meha Xezelwera Îsal, ji berê zêdetir xuya û eşkere bû ku ne Meclîsa Îranê parlamentoyeke raştîn e û ne jî nûnerên vê meclîsê, parêzvaniyê ji xelkê û ji maf û azadiyan dikin.

Di van meşên nerazîtiyê de hêzên tepisandinê ên Komara Îslamî bi biryara raşterast e Xamineyî bi çekan êrîşî ser xelkê kirin û bi sedan kesan kuştin. Wan herwisa bi hezaran kesan birîndar kirin û bi hezaran jî girtin û ew şandin îşkencegeh û çalên reş ku heya niha jî ti zanyariyeke zelal di derbarê çarenivîsa wan dest neketiye. Ev jî di demekê de bû ku ne meclîsê û ne jî nûnerên vê meclîsê bi tena serê xwe jî helwesteke



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران

Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.

مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

hêja li hemberî van kiryarên Komara Îslamî ji xwe nîşan nedan.

Van meşên girseyî ên îsal û salên derbasbûyî ên gelên Îranê bi giştî û bi taybet xelkê Kurdistanê, nîşan dan ku ti pêgeheke Komara Îslamî nîn e û nîşan didin ku xelk tam ji rejîma Îslamî a Îranê aciz bûye. Tevî ku Komara Îslamî, mezintirîn tawan li dijî xelkê serhildêr û eşdîtî pêk anîn, lê belê dixwaze bi pêkanîna şanoya hilbijartinan û kişandina xelkê bo ser sindûqên dengdanê, li pêşberî civaka navdewletî ji xwe re hinek cihê baweriyê bi dest bîne û riswabûna xwe veşêre.

Bi girîngîdan bi van raştiyan, Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê di civîna roja duşemiyê 2ê Befranbara 1398an biryara baykotkirina çalakane a hilbijartinên Meclîsa Şûraya Îslamî a rejîmê stand û di vê baweriyê de ye ku her kesek di vê rewşa Îran û Kurdistanê de xwe bike berendam yan jî biçe ser sindûqên dengdanê, bi awayekî raşterast xizmetem bi rewatîpêdana taweanên Komara Îslamî dike û weke hevparê wan ji bo van kuştin û tawanên salên derbasbûyî tê hejmarkirin.

Di vê derbarê de Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê berê xwe dide pêkhatayên xelkê Îranê û bi taybetî Kurdistanê û ji wan dixwaze neçin ser sindûqên şanoya hilbijartinan û rê nedin pîlanên gemar ên rejîmê ji bo kişandina xelkê bo ser sindûqan serbikevin.

Herwisa bila ew kesên ku bi her armanecê xwe ji bo nûneratiya vê meclîsê berendam kirine, vê raştiyê bizanin ku divê zêdetirî mesleheta xwe girîngiyê bidin berjewendiyên xelkê. Divê ew kes, bingeha berjewendî û xwestekên xwe li ser mana Komara Îslamî nedin.

Di dawiyê de em careke din tekezê li ser vê helwestê dikin ku bi rewşa niha, baykotkirina hilbijartinên nûnerên meclîsê, zêdetirî berê erkeke nîştîmanî û netewî tîne ser milên me.

Em bi vî awayî hemû bi hev re wê li hemberî pîlamanên rejîmê serkevin û NAyeke mezin bêjin remînê û bi vî awayî, emê bikarin bersiva xwepêşananên nerazîtiyê ên xelkê bidin û rêzê li qurbanî û birîndarên teêpisandinên vê dawiyê ên xelkê serhildêr li welatê bigirin.

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê

Partiya Demokrat û Partiya Zehmetkêşan a Kurdistanê li ser hevhelwestîyê tekez kirin

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, pîrozbahiya kongere û serketina rêberatiya nû li Partiya Zehmetkêşan a Kurdistanê kir.

Roja Duşemî, 9`ê Befranbara 1398`an (31`ê Kanûna Pêşîna 2019`an), şandeke bilind a Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, bi serpereştiya “Mîstefa Hicrî”, Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, serdana Partiya Zehmetkêşan a Kurdistanê kir û ji aliyê heyeteke bilind a wî Partiyê ve bi serokatîya “Se`id Xalîd”, Cihgirê Sekreterê Giştî, pêşwazî ji wan hate kirin.

Di vê dîdarê de, “Mîstefa

Hicrî” tevî pîrozbahiya serketina kongere û hîlbijartina rêberatiya nû bo berdewamiya kar û tekoşîna Partiya Zehmetkêşan kir, û tekez li ser dostayeti û hevpewendî digel wê Partiyê û rêberati û berpîrsên ku di kongereya nû a Partiya Zehmetkêşan de hatine hîlbijartinê kir.

Her di vê civînê de, tevî îşarekirinek bi rewşa heştyar a deverê û rewşa Kurdistanê bi hemû beşên wê re, herwisa “Mîstefa Hicrî” basek li ser rewşa Kurd li Îran û Îraqê kir û sedemên bingehîn yê ser rêya Kurdan, Komara Îslamî bi mezintirîn astenge li ser rêya gihîştina xelkê û nemaze Kurd bi azadî û geşeya civakî û siyasî bi nav bir.



Her di vê dîdarê de, “Se`id Xalîd”, tevî dana hindêk zanîyarî li ser kongereya wan, bas li ser diruşma Partiya Zehmetkêşan kir û her yek ji wan rûn kir ku bi çi mebestek û li ber çi sedemekê ev diruşmane hîlbijartine.

Di berdewamiyê de, navbirî tevî cextkirin li ser yekrêziya navmalê Kurd li hemû beşan,

bas li hewcehiyên detpêkî yê Kurd di wê rewşa hes-tiyar de kir ku di bûyerên Îraqê de, hewceye zêdetir li yek nêzîk bin û hevahengî û hevhelwestiya siyasî zêter bo Kurd li hemû tiştêkê hewce-tire.

Di vê dîdarê de, li ser yekgirtî û berdewamiya pêwendîyan tekez kirin.

Peyama pîrozbahiya Mîstefa Hicrî bo Selahedîn Beha`edîn

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, di peyamekê de pîrozbahî li “Selahedîn Beha`edîn”, Emnîdarê Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê kir.

Peyam wiha ye:

Rêzdar, mamoşte Selahedîn Beha`edîn

Emnîdarê Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê

Silav û rêz

Bi boneya helbijartina te yê rêzdar wekî Emnîdarê Yek-

girtûya Îslamî, em pîrozbahiya xwe pêşkêş dikin û ji rêya te yê rêzdar ve pîrozbahiya tev endamên rêberati yê hîlbijarteyên kongerereya heştêmîn dikin.

Bi vê hêviyê rêberatiya nû ya Yekgirtû dewreke zêdetir bilîze li yekgirtina hêz û aliyên herêma Kurdistanê ku hewcehiyeke serekiye di vê rewşê de ku Îraq têde derbas dibe, herwisa alîkar be bo ber bi pêşveçûna rewşa Kurd li hemû beşên Kurdistanê de. Digel rêzeke dûbare

Partiya Demokrat a Kurdis-



tana Îranê
Lêpirsyarê Giştî
Mîstefa Hicrî
9`ê Befranbara 1398`an
30`ê Kanûna Pêşîna 2019

Peyama pîrozbahiya “Mîstefa Hicrî” bi hilkefta ser sala nû a Zayînî

Mîstefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, di peyamekê de bi hilkefta hatina ser sala nû a Zayînî, li Mesîhên Îran û Kurdistanê pîroz kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Ser sala nû a Zayînî û roja jidayîkbûna Mesîh, pîroz be.

Bi hilkefta roja jidayîkbûna hezretê “îsa Mesîh” û ser sala nû a Zanînî, pîrozbahî li tev peyrewên Mesîh, bi taybet

Mesîhên Îran û Rojhelatê kurdiştanê dikim.

Hêvîdarim rojên wê cejnê, rojên pir xweş û keyf û ser sala nû a Zayînî saleke pir ji azadî û dadperwerî be bo hemû aliyekê.


Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî



Gelo destwerdana Tirkîyê ya di Lîbyayê de, wê bibe sedema piştgiriya Ewropî-Erebî ji bo pirsê kurdî li Sûriyê



N: Ebdulêzîz Qasim

Tê zanîn ku Tirkîyê ti çavkaniyên neft û gazê nînin û di heman demê de teknolojîyeke pêşkeftî jî nîne wek ya li hin welatên Ewropî ji bo bikaranîna enerjîya alternatîf û kêmkirina hinardekirina sotemeniyê, nemaze neft û gazê, ji ber ku ji 95% zêdetir hewcedariyên xwe yên neft û gazê ji Îran û bakurê Afrîka (Nîcerya û Algeria) tîne, û li gorî raportên aborî ku Tirkîyê di sala 2018 de nêzikî 42 mîlyar Dolar ji bo kirîna enerjîyê xerc kiriye, û tê pêşbînîkirin ku ev hejmar bigihîje 45 mîlyar Dolaran li dawîya sala 2019'an, hevdem ku piraniya peymanên wê yên gazê bi Rûsyayê re, tevî rêkeftina (boriya Balkan ya gazê) encam nedaye û ev rêkeftin dê heta 2022 bi dawî bibe, ku Tirkîyê pêdivî bi çavkaniyên alternatîf heye, nemaze bi zêdebûna guhertinên rewşa siyasî ya deverê û tevlîbûna wê di krîzên herêmê de, nemaze di krîza Sûrî de, û ji bo peydakirina sotemeniya alternatîf, lêgerînên xwe di deriya Spî de ji bo peydakirina neft û gazê di mehên dawîn yên sala borî de zêde kirin, piştî têkçûna hewldanên wê yên digel Qeterê ji bo dirêjkirina boriya gazê ji Qeterê heta Sûriyê û heta Tirkîyê û Ewropayê, û herweha piştî axaftina li ser hebûna depoyên gaza siruştî li peravên Sûriyê, Lubnan, Îsraîl û Misrê yên li ser deriya Spî, tevî ku peymanên navdewletî dibin rêgir li pêşîya hewldanên Tirkîyê, lê wê di mehên borî de, çend keştiyên lêgerînê ji bo neftê şandin peravên rojhilat yên deriya



Spî li Qibrisê, lê ev hewldan ji aliyê Yonaniştan, Misr û Qibrisê ve hat redkirin û herwiha ji aliyê Amerîkayê ve jî hate şermezarkirin û hejmarek biryarên Ewropî ji bo sepandina sizayan û tedbîrên aborî li ser Tirkîyê hatin standin û wezîrên derve yên Ewropî biryar dan ku Tirkîyê ji 145 mîlyon Euro bêpar bikin ku ji hêla sindoqa Ewropî ve hatibû pêşkêşkirin ji bo sala 2020'an.

Armanca Hikûmeta Tirkîyê bi dagîrkirina devera rojhilata Kurdistana Sûriyê aşkere bû, ku pêşîyê bigire li avakirina ştatûyek Kurdî û herwiha ji bo kontrolkirina kêlîngehên neftê yên Heskê û Dêrazorê di 9ê cotmeha 2019an de, lê ev hewldana Tirkîyê raştî biryara Amerîkî hat ji bo paraştina kêlîngehên neftê ji her dagîrkariyekê.

Rêkeftinên danîna sînoran di navbera Tirkîyê û hikûmeta "Al-Saraj" li Lîbyayê ew jî tê di çarçoveyê hewldanên Tirkîyê de, ji bo bibe rêgirê derya di nav ava deriya Spî de û ji bo kontrolkirina erdên herî dewlemend yên neftê li bakurê Afrîka, sîdwergirtin ji rewşa Lîbyayê û ev peyman ku di 27ê Mijdarê de hate îmzekirin û ji aliyê gelek welatên Ewropî û Ereban hate redkirin.

Di vê çarçoveyê de pirseke herî giring tê rojevê, sebarek pirsgerêka mîletê Kurd e, ku gelo kurd dikarin mîfayê ji vê yekê bigirin ji bo wergir-

tina piştgiriya mafên netewî yên xwe li Sûriyê ji welatên Ereban û Ewropî yên li dijî dagirkeriya Tirkîyê li Lîbyayê, tevî mîfawergirtin ji mijara pêwendîya Tirkîyê û Qeterê bi grûpên girêdayî tevgera Îxwan Misilmîn ya radîkal di cîhana Ereban de, û bikaranîna komên çeteyên opozisyona sûrî yên li Efrînê, Serêkaniyê û Girêspî ji bo dagîrkariya Lîbyayê û piştgirîkirina hikûmeta "Siraj" ya girêdayî rêxistina "Îxwan Misilmîn", û dibe Tirkîyê hevahengiyan bike digel komên terorîst li Afrîkayê wekî grûpên "DAİŞ", "Al Qaeda", û "Bokoheram" ji bo bikaranîna hin kiryanan ...hwd. Wekî me dît ku Misr yekem welatê Ereb bû, û paşê Erebiştana Si'ûdî û "Emirates UAE", ku bilez êrişên Tirkîyê li ser Serêkaniyê û Girêspî di 9'ê cotmeha 2019-an de şermezarkirin û banga civînek awarte ya Komkara Ereban kirin, herweha gelek welatên girîng yên Ewropî, nemaze Fransa, projebiryareke hevbeş ya Ewropî ji bo şermezarkirina dagirkeriya Tirkîyê pêşkêşî Encûmena Ewlehiya Navdewletî kir, ku bi vî awayê seqlolî ya Amerîkî-Rûs-Cînî hate redkirin di berjewendiya dagirkeriya Tirkîyê de. Hewldan ji çend welatên Ereban hene da ku bêtir dorpeçên Erebî li ser Tirkîyê û hewleta Qeterê zêde bikin û gropa "Îxwan Misilmîn" bêxin di nav lîsteya grûpên terorîst de, û di vî warî de

nêzîkatiyek Amerîkî heye, û ev yek bi zelalî di hewldanên Erebiştana Si'ûdî de xuya bû di kêmkirina rola Koalîsyona Sûrî di Komîsyona diyalogên Sûrî de bi rêya piştgirîkirina hin kesayetiyên serbixwe di konferansa "Riyazê" ya dawiyê de, û kurd dikarin van pêşatan bikar bînin ji bo nêzîkatiya navmala kurdî (ya zehmet) û herweha ji bo bideştixistina piştgiriya siyasî ya Ereb-Ewropî ji bo pirsgerêka Kurd, û Encûmena Niştîmanî ya Kurdî "ENKS" dimîne ya herî berbîjar ji bo roleke weha, û ENKS bi tenê dikare bi bizaveke weha rabe heta bîyê hebûna yekîtiyekê di navmala kurdî de, lê di heman demê de dê raştî astengiyan bibe ji ber hebûna wê di nava Koalîsyona Sûrî de.

Ji ber vê yekê divê Encûmena Niştîmanî ya Kurd bi cidî û erênî hîzr bike da ku xwe vekîşîna ji Koalîsyona Sûrî, bi danîna berjewendiya netewî ya bilind ya Kurd wekî pîvanek ji bo her gavekî, ji ber pêwîstiya netewî û exlaqî, tevî ku Koalîsyon bûye nûnerê milîşên terorîst li deverên kurdî yên dagîrkirî, ku rojane tawanên şer û jenosîdê li dijî gelê me yê Kurd tene pêkanîn, û hem jî ku Koalîsyon bi temamî êdî nûnertiya hemû xelkê Sûriyê nake, û ji bilî piştgiriya Tirkî- Qeterî ti piştgiriyeke navnetewî û Ereban wer-nagire, û rûreş bûye nemaze piştî bûyerên vê dawiyê yên Idlibê.

Îran piştî kuştina Qasim Silêmanî



N: Dara Natiq

Di sêhem roja destpêka sala nû a mîladî de, li bexdaya paytextê Îraqê “Qasim Silêmanî” fermanê Spaha Qudis û yek ji terorîstên navdewletî û darêjerê êrîşên vê dawiyê bo ser balyozxaneyên Amerîkayê li Îraqê, bû armanca balafirên bê pîlot yê Amerîkayê û tevî çendîn berpirs û leşkerên ser bi vê girûpa terorîstî hatin kuştin.

Qasim Silêmanî wek yek ji terorîstên navdewletî, dest ji teror kirina sedan çalakvanên siyasî yê dijberî rejîmê, teysandina agirê şerê navxweyî û kavilkirina çendîn wîlatên herêmî, kûştina sedan hizar kesî û koçberkirina bi milyonan mirovên bê guneh li ser cih û warên xwe di welatên weke Yemen, Sûriye, Îraqê û herwisan kuştin û birîndarkirina bi hezaran xelkê nerazî û bêzarbûyî li rejîma Îslamî a Îranê di hundire wîlat de.

Kuştina Qasim Silêmanî yê terorîst weke kesê duhem û herî bi deshîlat di Îranê de û yek ji kesên nîzîk û hezkirî yê rêberê Îranê ku di sala borî de “medaliya Zolfeqar” weke nîşana herî bilind a leşkerî di Îranê de ji sîngê wî hat dayîn, girîn û bandorek raşterast û çarenûsaz li ser heybet û paşeroja rejîmê çê dîke. Ji ber ku piştî çar dehikan ji rimbazên Spaha Quds û geşepêdan û saportkirina terorîzma navdewletî, çêkirina alozî û şer û pevçûn di herêmê de, çêkirina şer û fitneyên olî û qewmî û kuştina bi sedan hezar kesî û gelek cinayetên dijî mirovî di herêmê de, bo cara yekem û bi kiryar derbek herî mezin û bi bandor



jê tê dan û bi eşkere jêre dibêjin êdî bes e. Kûştina wî terorîstê han yê bandorek mezin li ser biryarên rejîmê û herwisan kuştina serdar û karakterê herî nîzamî yê rejîmê bi wî avayî bandorê li ser haw kêşeyên siyasî yê Rojhilata Navîn çê dîke û çarenivîsa pêwendiyên di navbera Îraq û Amerîkayê de ber bi aloziyek nediyar ve dibe. Derbasbûna çar dehek ji pêwendiyên aloz û rikeberêya di navbera Îran û Amerîkayê, yê bikewin di nava qonaxek hesas û şerê raşterast bi hev re. 40 sal berî niha û piştî girtina balyozxaneyên Amerîkayê ji aliyê rejîmê û destbiserdagirtina tev karmend û dîplomatên wan li Tehranê, dujmînatî û aloziyên di navbera wan du wîlatan de bi fermî dest pêkir. Niha jî û piştî derbasbûna 40 salan bi ser vê bûyera han û di kiryarek weke wê demê de û ji aliyê girûp û alîgirên rejîma axûndî di Îraqê de û bi fermana Tehranê êrîşî ser balyozxaneyên Amerîkayê li bexdayê tê kirin û di encam de fermanê Spaha Quds a ser bi rejîma Îslamî, “Qasim Silêmanî” tê kuştin û bi vê yekê şerê wan du wîlatan di qonaxa şerê bi wîkalet re, derbasî şer û pevçûnek raşterast dibe.

Di rastî de Spaha Pasda-

ran stûna bingehîn a nîfûz û hêjmûnî û emniyeta rejîmê ye di Rojhilata Navîn de. Nemaze Spaha Quds ku di dehekên derbasbûyî de bi serokatiya Qasim Silêmanî, mil bi mil siyaseta derve a Îranê rol û bandorek berçav û mezin di guhartina û bûyerên di Rojhilata Navîn û nemaze Îraq û Sûriyê û Yemenê û... hwd de hebûye. Bê şik bi kuştina wî fermanê terorîst yê Îranê êdî bandor û rola Îranê di nava hêz û girûp û kesayetên wan wîlatan de lawaz dibe û astenge ku kesek din wek wî terorîstê hatî kuştin bikare hêjmûnî û bandora rejîmê li ser pêkhatêya wan wîlatan biparêze. Rejîma Îranê piştî kuştina Fermanê Spaha Quds a terorîst li hember du egeran daye; yan bersiva vê kiryara Amerîkayê bi awayek leşkerî bide û yan jî bi awayek din raya Besîc û Pasdarên xwe razî bike? Rejîm gava bixwaze bi êrîşa leşkerî bersiv bide, bê guman şîyan û îradêya rûbirûbûna şerek raşterast bi yek ji zilhêzên herî xwedî hêz yê cîhanê re nine û derencama bersivê han ji aliyê rejîmê ve yê bibe sedema şerek mezin û ji navçûna yekcarî a text û bextê wê nîzama dîktator. Lê di dema niha de rejîm hewil dide ku bi vekîşiyana yekcarî di rêketinamêya (BRCAM)

ê de û herwisan haş û hûş û gef û goreşeyan raya alîgirên xwe razî biken û hevsoziyekî civakî çê bikin. Li pêngavek din de bi kom civîna perlemanê Îraqê û biryara derxistina hêzên Amerîkayê di wî welatî de paşekişeyê bi hêzên Amerîkayê di wî welatî de bike.

Hêjayê gotinê ye ku ew biryara Parlemanê Îraqê zêdetir weke pêşniyareke û erkê naxe ser milê encûmena wezîran û bo cî bi cî kirinê û bi baldan bi kirîza kûr a siyasî di wî wîlatî de astenge ku yekhelwêstî û yekdengiyek hevpar bo derxistina hêzên Amerîkayê di Îraqê de bihê çêkin.


Lê kûştina fermanê terorîst yê rejîma Îranê, bi wateya binbîrbûn û dawîhatina terorê nine. Rejîma Îranê her di bingeh de xwediyê îdolojîyek terorîstî û şerxwazî ye. heya ku rejîma Îranê bimîne yê teror û şer û malvêranî di cîhanê de hertim berdewam bibe. Ji ber ku rejîma îslamî a Îranê bi xwe makeya sereke a terorîzm û malvêranî ye. Rejîm yê wê demê ber bi aşî û aramî û tenahiyê ve here ku tewahiya rejîma terorîst û dîktator a Îranê ji nav biçê û tac û textên wan xwînmijan bi armanc were girtin û bihên herifandin.

Nerîna Lîderan



Donald Turmp:

“Me Qasim Silêmanî kuşt ji bo şer rawestînin, ne ku ji bo destpêkirina şerekî nû”.



Vladimir Putin:

“Kuştina Qasim Silêmanî dê aloziyan kûrtir bike”.



Morgan Ortegas:

“Fermana kuştina Qasim Silêmanî biryareke dijwar bû ji bo Donald Turmp, lê bi mêzêkirina êrîşên wê dawiyê yên girûpên çekdar yên girêdayî rejîma Îranê li dijî Amerîkayê, ev biryare diba hatiba dan û ev êrîşe jî hatiba kirin.”.



Mihemedcewad Zerîf:

“Amerîkayê şasiyeke mezin kiriye, guman nîne ku wê Îran bersivê bide”.

Para Kurdan di kabîneya Rûhanî de



N: Eskender Ceiferî

Ew Kurdên ku piştgîri di-dan Hesên Rûhanî, bi hêvî bûn ku ewê herî kêrî wê carê sê wezîrên Kurd pêşniyar bike. Lê wê carê hem Bijen Zengene take wezîrê Kurd ê şe kêr mabû ji wezareta Petrolê bêpar be û hem jî ti Kurdekî din ê ku sunnî be, ji aliyê serokkomar ve nedihat pêşniyarkirin. Lewma jî êdî piştî kabîneya duyem a Rûhanî, ti baweriyê islahxwazên Kurd jî bi wî nemaye.

Wê demê ji bo cara yekemîn malpera Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî, bi rengekî ciddî bal kişandibû ser mijara destnîşankirina wezîrên kabîneya dewletê û gotibû qet Xamineyî destêwerdanê di vê mijarê de nake. Li gor daxuyaniya nivîsîngeha Xamineyî jî, hemû endamên kabîneya duyem ya Rûhanî li gor biryara wî nedihatîn hilbijartin.

Hesên Rûhanî di hilbijartinên gerra berê de jî bû serokkomarê rejîmê û hewl dida baweriyê ji bo wezîrên pêşniyarkirî bi dest bixîne.

Di 38 salên desthilatdariya Komara Îslamî de tenê wezîrê Kurd jî navçeyên sunnî yên bi bandor jî nehatiye danîn. Ji sala 1979'an



ve heya niha 12 gerrên hilbijartinên serokkomariyê li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendam. Serokkomarên aliyê reformxwazan weke Rûhanî û Xatemi jî ku gelekî dengên Kurdan jî bi dest xistin, weke serokkomarên din qet Kurdekî sunnî nekirin wezîr.

Wezîrên ku di postên heştyar de ne, bi şewra Sipaha Pasdaran, Civata Ewlehiya Bilind û Civata Destnîşankitina Berjewendiyên Hikûmetê tene hilbijartin. Ev şewr, qet nayê ragihandin û tê îdiakirin ku wexîr, bê destêwerdan tene pêşniyarkirin. Lê di rastî de endamên kabîneyê, baweriyê xwe ne ji parlamentaran belkî ji saziyên ewlehî distînin. Wezîrên weke Îstixbarat, Paraştin, Navxwe, Derve û Pêwendiyên di bin bandora biryara navendên girêdayî Xamineyî de tene pêşniyarkirin.

Di yasaya bingeîn ya Komara Îslamî de hatiye te'ezîkirin ku rêberê rejîma Îslamî a vî welatî di karûbarên siyaseta navxwe, derve û parastinê de bi bandor e. Ji xeynê ku ew wezîr jî aliyê nivîsîngeha Xamineyî ve tene pêşniyarkirin, serokkomar

divê bixwe jî rewatiyê ji wî bistîne.

Niha jî hilbijartinên geraa nû a Meclîsa Îslamî a Îranê nêzîk dibin û heman kar jî aliyê saziyên ewlehî û Şewra Paraştinê tene kirin û berendamên hilbijartinan jî filterên wan derbas dibin.

Ji bilî mijara baykota çalakane ku ji aliyê partiyên Kurd ve biryara wê hatiye şandin, wê carê islahxwazên Kurd jî zêde gunh nadin hilbijartinê û li gor wan, hem piştguhxiştina Kurdan ji aliyê Rûhanî ve û hem jî wê dawiyê kuştina xwepêşanderan, du sedem in ku divê hilbijartin bêne baykotkirin.

Hin ji hêzên reformxwaz ku îdiayê dikin ku nerîneke nermtir li hemberî Kurdan hene, carna bedêla siyaseta xwe di hevrikiya Sipaha terorîstî a Pasdaran de didin. Ebdulla Nûrî ku di dema desthilata seyîd Mihemed Xatemi de wezîrê navxwe bû, ji ber ku ragihandibû nikare bi Mihemedrizza Neqdî rêveberê Îstixbarata Sipahê û Hidayet Lutfiyan rêveberê hêzên polîs re kar bike, Xamineyî ew nekire cîgirê fermandarê giştî ê hêzên çekdar.

Kasibkarekî xelkê bajarê Dîwandereyê, bi teqeya rastê a hêzên leşkerî canê xwe ji dest da


Kasibkarekî xelkê bajarê Dîwandereyê, bi teqa rastê a hêzên leşkerî yên hikûmetî di rêya bajarê Endîmişk ya ser bi parêzgeha Xûzîstanê de, canê xwe ji dest da.

Li gor rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, roja Înê, 6'ê Befranbarê, kasibkarekî Kurd yê bê navê “Se'îdî Sefayî”,

xelkê bajarê Dîwandereyê, di rêya bajarê Endîmişkê bi teqeya rastê a hêzên leşkerî canê xwe ji dest da.

Bi gotina çavkaniyekî agehdar, hêzên leşkerî yên hikûmetî bi awayekî teqe ji wî kasibkarê Kurd kirine, ku navbirî ti core tiştekî qaçax pê re nebûye.

Hêzên leşkerî yên hikûmetî



bi bê agehdarkirina berê, teqe ji wî kasibkarê Kurd kirine û di encamê de navbirî canê xwe ji dest da.

Trump mercê derketina ji Iraqê eşkere kir

Serokê Amerîkayê gefên sepandina cezayên giran û tund li Iraqê xwar in ku eger hat û ew hêzên Amerîkayê neçar bikin ku ji wî welatî derkevin.

Serokê Amerîkayê Donald Trump gefa tolhildaneke tund li Îranê xwar, eger ew hewla tolhildana kuştina Qasim



Sulêymanî bide.

Trump ji rojnamevanan re ragihand ku Amerîka ji Iraqê dernakeve, eger hikûmeta Iraqê heqê bingehên asmanî yê Amerîka li wî welatî nede.

Trump got, bingehê wan ya gelekî buha li Iraqê heye, bi milyon dolaran li ser avakirina wê hatiye xercki-

rin, heta ku Iraq wan pereyan nede, ew ji wir dernakevin.

Trump got, eger Iraq daxwaza derketina hêzên Amerîkî bike û ew kar ne bi rêyeke dostane be, wê Amerîka cezayên tund bi ser Iraqê bisepîne, ku gelekî ji cezayên bi ser Îranê sepandibû mez-intir be.

Rejîma Îranê ragihand ku êdî pabendê rêketina etomî nebe.

Rejîma Îranê bi fermî bidawîhatina rêketina etomî ragihand û diyar kir, ji niha pê ve hemû astengên li ber bernameya etomî ya wî welatî têne rakirin û êdî ti sînorek ji bo bernameya etomî ya wî welatî nîne.

Rejîma Îranê di daxuyaniyeke fermî de ragihand, ev biryar pêngava pêncem û dawî ya kêmkirina pabendiyên wî welatî di çarçoveya rêketina etomî de ye.

Rejîma Îranê dibêje, ji niha pê ve bernameya etomî ya wî welatî dê li gor pêwîstiyên teknîkî yên bernameyê berdewam be, û Saziya Enerjiya Etomî ya welat erkdar kiriye



bi hevahengî digel serokomar, pêngavan bavêje û rêkarên pêwîst bicih bîne.

Herwiha di daxuyaniya rejîma Îranê de hatiye gotin: “Alîkariya Îranê digel Ajansa Nadewletî ya Enerjiya Etomî dê wek berê berdewam be. Di egera rabûna ceza û dorpêçan û sûdmendbûna Îranê ji qazancên rêketina etomî, Komara Îslamî ya Îranê amade ye vegere ser pabendiyên xwe yên di rêketina etomî de.”

Rejîma Îranê Rêxistina Enerjiya Etomî xwe erkdar kir ku wan

rasparedeyên rejîmê bi hevahengî digel Serokomar cîbicî bike.

Pêştir Amerîka ji rêkewtina etomî ya digel rejîma Îranê vekîşiyabû û dorpêçên giran xistibûne ser Îranê.

Ev yek di demekê de ye ku piştî kuştina Femandê Spaha Quds a terorîst a ser bi Apaha Pasdaran a rejîma Îranê, Qasim Silêmanî ji aliyê Amerîkayê ve, alozî di navbera herdu welatan de zêde bûne û herwiha herdu alî gefan li hev dixwin. Berpirs û rayedarên Îranê dibêjin ew dê tola Qasim Silêmanî yê terorîst ji Amerîkayê hildin.

Amerîka bi berdewamî girûpên girêdayê rejîma Îranê dike armancê xwe

Li êrîşa balafirên Amerîkayê li ser karvanê milîşên Bizava Îslamî ya Iraqê ku taya ser bi Heşda Şe`ibî ye, 6 kes hatine kuştin.

Telewîziyona fermî a Iraqê ragihand, ku balafirên Amerîkayê karvanekî çekdar ên Bizava Îslamî naskirî bi gurdanên Îmam Elî, kirine armaca êrîşa xwe, ku di encamê de 6 kes hatine kuştin.

Hate ragihandin, ku yek ji kuştîyan, Şibul El zeydî, serokê wê girûpa ser bi rejîm Îranê yê.

Herwisa li nûçeyêke dinê de hate ragihandin, ku şeva 14 Befranbarê, binkeyê Heşda Şe`ibî li cihekê bi navê El-bulkemal El- Qa`em, li nêzikê sinorê Sûriyê, ji aliyê balafirên Amerîkayê ve




hatiye bombebarankirin, û 5 kes hatine kuştin û xisareke zaf gihaye wan.

Herwisa Telewîziyona Iraqê ragihand, ku taqmeke din ji Heşda Şe`ibî li devera El- Tac li bakûra Bexdayê kevtine ber êrîşa balafirên Amerîkayê û hejmarek kuştî û birîndar lê kevtine.

Piştî vê yekê ku milîşiya û girûpên girêdayê rejîma Îranê, û li jêr fermana Qasim Silêmanî êrîş kirine ser Balyozxana Amerîka li Bexdayê, Amerîkayê di dijkiyarê de Qasim Silêmanî û Ebû Mehdî û çendîn kesên dinê kuştin û niha jî bi berdewamî wan dike armancê xwe.

Çalakvanekî jîngeparêz bo girtîgeha bajarê Sineyê hate veguhaştin



Çalakvanekî jîngeparêz yê xelkê bajarê Sineyê, bo derbaskirina heyama hepsiya xwe, bo girtîgeha nevendî ya wî bajarî hate veguhaştin.

Li gor rapora ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, “Humayun Behmenî”, çalakvanê jîngeparêz, bo derbaskirina heyama hepsiya xwe, bo girtîgeha nevendî ya bajarê Sineyê hate veguhaştin.

Ew çalakvanê jîngeparêz di rêketa 10`ê Sermaweza sala 1397`an, ji aliyê hêzên îtila`atê ve hatibû desteserkirin û piştî 5 mehan derbas bûn li ser desteserkirina wî, bi danîna barimteya 500 milyon tumenî bi awayekî

demkî hatibû azadkirin.

Taya 1 ya dadgeha şoreş ya bajarê Sineyê, ew çalakvanê Kurd bi tohmata “alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên opozîsiyon yên hikûmeta Îranê, têkdana emniyeta neteweyî û piropagende li dijî nizamê”, bi 5 sal hepsa te`izîrî ceza dabû.

Cezaya 5 sal hepsa te`izîrî ya wî çalakê jîngeparêzê, li taya 4 ya dadgeha pêdaçûnê ya bajarê Sineyê bi 2 sal û 6 meh û 15 roj hate kêmkirin. Ew çalakvanê jîngeparêz, piştî piştraşt kirina cezayê wî ji aliyê dadgeha pêdaçûnê ve, bo girtîgeha nevendî ya bajarê Sineyê hate veguhaştin.

Di encama teqeya hêzên leşkerî de du kolber hatine birîndarkirin



Du kolberên Kurd yên xelkê bajarê Xoyê bi sedema teqeya hêzên sînorî di devera Qutûr de, hatine birîndarkirin û bo nexweşxanê hatine veguhaştin.

Li gor rapora ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, eva roja Şemî, 14`ê Befranbarê, du kolberên Kurd yên bi navên “Elî Yûsifî” ê temen 25 salî kurê Mihemed û “Bêhnam Elîzade” ê temen 20 salî û kurê Husên û xelkê gundê “Belcuk” a ser bi devera Qutûr a girêdayê bajarê Xoyê, bi teqeya hêzên leşkerî hatine birîndarkirin. Bi gotina çavkaniyeke age-

hdar, ew du kolber digel hejmarek kolberên din di bilindahiya gundê “Belcuk” a ser bi devera Qutûr, raştî gullereşandina hêzên sînorî hatin.

Herwisa wê çavkaniyê daye xuyakirin: “Hêzên leşkerî li sînorê devera Qutûr ya ser bi bajarê Xoyê, bi bê agehdarkirina berê, teqe ji wan du kolberên Kurd kirine.

Bi sedema teqeya raştaşt a hêzên sînorî, ew du kolberên Kurd birîndar bûne û di encamê de bo nexweşxaneyê bajarê Xoyê hatine veguhaştin.


Du welatîyên Kurd di bajarê Sineyê de hatine desteserkirin

Du welatîyên Kurd yên xelkê bajarê Sineyê, piştî desteserkirina wan, ew bo cihekî nexuya veguhaştin.

Pêka rapora ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, şeva Yekşemî, 8`ê Befranbar, 2 welatîyên Kurd yên bi navên “Saman Mîrekî û Luqman Feyzî”, xelkê bajarê Sineyê, ji aliyê hêzên îtila`atê ve hatine desteserkirin.

Ew 2 welatîyên Kurd, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî, di şeqama “Hesen Ava”yê de hatine desteserkirin.

Ew 2 welatîyên Kurd yên



xelkê bajarê Sineyê, piştî desteserkirina wan, ew bo cihekî nexuya veguhaştine û ji qedera wan ti zanîyariyek ji berdest nîne. “Saman Mîrekî” kedkarê avahî sazî ye û kedkarê demsaliyê ye.

Heya belavbûna vê nûçeyê, ji sedema desteserkirina wan 2 welatîyên Kurd, ti zanînek ji ber dest nîne.

Îdareya Îtila`ata Îranê dest bi gazîkirin malbatên pêşmergeyan kiriye

Givaşên îdareya îtila`ata Rejîma Îranê di Kurdistanê de li ser malbatên pêşmergeyan berdewam e û tevî gazîkirina wan bi navendên îtila`atê, û gef jî, ji wan dixwin.

Di wan çend rojên derbasbûyî de, îdareya îtila`ata bajarê Pawê, hejmarek ji malbatên pêşmergeyan gazîkirine û ew xistine di bin lêpirsînan de.

Îdareya îtila`ata Pewê tevî gazîkirina malbatên pêşmergeyan, gef ji wan xwarine, ku nabe bi ti awayekî di xwenîşandanên 5`ê Berfanbarê de amade bin.

Hevdem karbideştên îdareya îtila`atê di bajara Banê de, gef ji birêveberên kanalên tîlêgramî xwerine ku, nabe ti gotar û postekê li derheq girêva sertaserî ya 5`ê Befranbarê belav bikin.

Rejîma Îslamî ya Îranê ji tirsê xwenîşandanên xelkê, bi her awayekî dixwaze rêgirî ji xwenîşanderan bike.

Li ser xweşa Partî û aliyên Kurdistan û Îranê yên dijberî rejîma Îranê, biryare roja 5`ê Befranbar ya çileyê şehîdên xwenîşanderên meha Xezelwerê, xelk girêva sertaserî birêve bibin.

Dengbêjê bi nav û deng ê xelkê bajarê Makûyê koça dawî kir



Dengbêjê bi nav û deng, “Moseyîb Gulşenzade”, piştî vê ku raştî nexweşîyeke dijwar hatibû, bo heta hetayî dengê xwe yê xweş bi cih hêla û çû ser dilovanîya xwe.

Dengbêjê Kurd ê bi navê “Moseyîb Gulşenzade” xelkê gundê Gol anku (Gola Morse) a ser bi bajarê Makoyê û reûniştîyê gundê Gure

Tepe ya ser bi bajarê Urmiyê, piştî vê ku raştî nexweşîyeke dijwar hatibû, roja çarşemî 4'ê Befranbarê çû ser dilovanîya xwe. Yek ji dengbêjên dengxweş ji devera Makoyê, dengbêj Moseyîb Gulşenzade bû. Moseyîb sala 1340 a Rojî, li gundê gol anku (Gola Morse) ji devera bajarê Makoyê jidayîk bibû, û navê bavê wî

Ferzinde ye ji eşîreta Qendikan ji êla Celalî ye. “Moseyîb Gulşenzade” di dema xwe de di civînekê digel Rojanmeya Agirî, hejmarê 350 î û rûpela 10'an de wiha gotibû: “Min her ji dema zarokatiya xwe de hez ji dengbêjiyê dikir, û Ji dema 6 saliya xwe de min hez ji guhdan bi dengê radyoyê dikir, û ez li cem radyoyê dirûniştim û min guhdariya dengê Karapêtê Xaço, Şeroyê Biro û yên din dikir, û ştranên wan fêr dibûm û li her cihekê ku derfet heba min ew digotin.

Moseyîb pir bas ji deng û ştranên Kawûs Mîlanî dikir û ji ser wê bawiriyê bû ku, di navbera dengbêjên deverê de, “Kawûs” ji aliyê deng û nasîna ştranan û herwisa dengbêjan, ji aliyê helbest û mîlodiya ştranan de, zanînen herî baş hene.

Moseyîb Gulşenzade, parek

zêde ji helbest, sitran û muzîka xwe, bixwe aniye pê û afirandiye Moseyîb heya niha 4 CD û kaset, berhev û weşandine û sitranên wekî:

Yarmiç
Goma maro
Behra Urmiyê
Soma biradoşt
Ferzinde li ada xanê
Û ...hwd, gotibûn.

Dengbêj Moseyîb li piraniya festîvalên muzîkên hundir ên Îran û Kurdistanê de beşdarî kiribû, û gellek caran ştran ştrandinibûn, û xelat jî wer-girtibûn.

Di 3'emîn festîvala folklorê Kurdî di sala 1390'î de li bajarê Pîranşarê, navbirî wekî dengbêjê bijartî hate nasandin.

Xwedêjêrazî li gundê Qurt Tepe li 5 KM rêka Urmiye-Mihabadê de dijiya, û xwediyê 5 zarokan e.

Tirkiye hewl dide tembûrê li UNESCOyê li ser navê xwe tomar bike

Tembûr amûrekî musiqiya irfanî ye û ji aliyê Kurdên Yarsanî ve weke amûrekî pîroz tê dîtin. Bi sedan sal e kelim, deqên ayînî û pîrozbahiyên Yarsaniyan li gel vê bi awaz ve tîr xwendin û di merasîmên ayînî yên Yarsaniyan de roleke sereke heye. Niha Tirkiye hewl dide li UNESCOyê wî amûrê Kurdên Yarsanî li ser navê xwe tomar bike.

Ji 72 meqamên Yarsaniyan ku bi tembûrê tîr xwendin 56 jê kelam in. Parêzgeha Kirmanşanê melbendeke sereke ya Yarsaniyan e. Tembûr zêdetir ji 4 hezar sal e di wê navçeyê de tê çêkirin û di-jenîn.

Omêd Qadirî, Rêveberê Mîrata Çandî ya Kirmanşanê derbarê hewldanên Tirkiyê yên bo tomar kirina wî amûrê Kurdî li ser navê xwe, dibêje, heta niha zanyariyeke zelal li ser van hewldanan di deştê wan de nîne.

Mihemed Hesên Talbî-



yan, Cîgirê Mîrata Çandî li Wezareta Çand û Pîşesaziya Deştî, red dike ku Tirkiyê tiştêkî bi vî rengî di malpera UNESCOyê de tomar kiribe.

Talbîyan amaje bi wê dike, “Eger Tirkiye bikeve nav hewldaneke bi vî rengî, Îran dê hewl bide bi hevbeşî be.” Ew dibêje, dosyeyên curbicur hene û ew nikarin hemûyan tomar bikin.

Tevî ku ev tembûr amûrekî mohra çanda Kurdî li ser e, lê Tirkiye dixwaze wî amûrê kurdewarî li rêxistina UNESCOyê li ser navê xwe tomar bike.

Elî Muradxanî, cîgirê berê yê Wezîrê Çand û Irşadê,

dibêje, “Em neçar in beşek ji pîşezasî û mîratên çandî bi hevbeşîya li gel hinek welatên din tomar bikin.”

Ev ji aliyê ti kesî ve ne cihê qebûl kirinê ye. Ferzad Şehsewarî, Serokê Encûmena Musîqaya Kirmanşanê, dibêje, grûpa wan ji 600 jenyarên tembûrê yên xelkê Kirmanşanê pêk hatiye ku eger barê darayî dabîn bibe, sê perçe musîqa bêstûm amade dikin û belav dikin bo ku rê li ber wê bigirin tembûr bi navê Tirkiyê li UNESCOyê bê tomar kirin.

Tembûr niha di asta niştimanî ya Îranê de jî weke amûrekî kevn nehatiye tomar kirin, ev pêş mercê tomarîya cîhanî ya

tembûrê ye.

Derwêş Pîrinyakan, Berpîrsê Grûpa Tomariya Cîhanî ya Kemançe, amaje bi wê dike, “Tirkiye nikare tembûrê li ser navê xwe tomar bike, eger balyozê Îranê li UNESCOyê li dijî vê hewldanê raweste.” Derwêş Pîrinyakan dibêje jî, “Berpîrsên çandê yên Îranê ti hewlekê bo tomar kirina tembûrê nadin.”

Omêd Qadirî, Rêveberê Mîrata Çandî ya Kirmanşanê, radigihîne, “Şarezayên Wezareta Mîratên Çandî soz dane me, heta deşt pêka havîna sala bê, Dallaho weke bajarê niştimanî yê tembûrê li ser asta Îranê tomar bikin. Lê hinek merc hene ku divê bîr cîbicîkin. Ji wan jî navlêkirina şeqamekê bi navê tembûrê û pêkanîna peykerekê bo tembûrê.”

Lê dibe ku heta Îran bi vê hêdikahiyê karûbarên li ser vê mijarê dimeşîne, ew derfet ji deşt biçe. RUDAW

Zimanê Kurdî

a- Em hatin gundê we, hûn jî werin yê me .

b- Mala we nêzî ya me ye .

c- Hevalên Memo ji yên Reşo pirtir in .

Diyar e ku di mînaka (a) yê de, cînavê “yê” bûye berkarê neraşteder bo karê nederhingêv “werin” . Di mînaka (b) yê de, cînavê “ya” bûye berkarê neraşteder, yê hevalkarê “nêzî”. Di mînaka (c) yê de jî, cînavê “yên” bi pêrbeşa “ji” bûye berkarê neraşteder .

7- Cînavên Nenas

Cînavên nenas ew bêje ne, yên ku cihê navekî nependî û nebinavkirî digrin, bêtî ku nependîya wan zelal bikin, yan jî celebê wan destnîşan bikin, tenê bi gelemperî li şûna wan bikar tên . Wek :

- Hinek hatin

Di vê mînakê de bêtîya “hinek” li şûna navekî nediyar bikar hatiye, em nizanin ew nav çi celeb e, yan jî bi çi taybetiyê ye. Dibe ku bêtîya “hinek” di mînaka me de cihê mirovnan, canewernan yan tiştinan girtibe, anku li şûna ku em bibêjin, “hinek hatin” em dikarin bibêjin : - Mêvanin hatin (hinek mêvan) . - Zarokin hatin (hinek zarok) . - Hespîn hatin (hinek hesp) . - Bizinin hatin (hinek bizin) . - Darin li ber avê hatin (hinek dar) . - Êzingin li ber avê hatin (hinek êzing) .

Navlêkirina van cînavan jî, di pirtûkên rêzimanî de bi gelek navên têvel hatiye. Her şarezayekî zimanê kurdî ew bi navekî berçav kirine :

- Celadet Bedirxan : “ Nebinavkirî “ .
- Reşîdê Kurd : “ Nependî “ .
- Kamîran Bedirxan : “ Nebinavkirî “ .
- Qenatê Kurdo : “ Nekifş “ .
- Feqe Huseyn Sagnîç : “ Nekifşî “ .
- Cigerxwîn : “ Nenas “ .
- Sadiq Behadîn Amîdî : “ Nenas “ .
- Nûrî Elî Emîn : “ Nadiyar “ .
- Tewfîq Wehbî : “ Mubhem “ .

Diyar e ku ev navlêkirin tev, ji hêla wateyê ve nêzî hev in û danasîna wan jî li nik wan şarezayan gelekî nêzî hev in . Li gora dîtina zimanzanan, ev cînavên nenas ji hêla formê ve dibin dû beş :

- Cînavên xwerû (sade) .

- Cînavên lêkdayî (hevedûdanî) .

1-Cînavên xwerû ew cînav in, yên ku ji bêtîyeke rût tenê pêk hatine, wek : “ yek, tu, çi, her, kes, tişt, hîç (hêç), heçî, hin (hind), çend, tibab, hemû (hemî), filan, bêvan (bêhvan), gî (giş), pirr, kêr, gelek, piç, tev (tevde)” . 2- Cînavên lêkdayî jî ew cînav in, yên ku forma wan ji cînavêkî xwerû zêdetir pêk hatine, wek : “her yek, her kes, her tişt, tu kes, tu tişt, filan kes, filan tişt, bêvan kes, bêvan tişt, hîç kes, hîç tişt, çi qas()wiqas() , hemû kes, hemû tişt....” . Diyar e ku ev cînavên nenas, ji hêla form û wateyê ve dikevin ber taybetmendiya navan, anku ew jî weku navan dikevin ber verêse (tewangê) û nîşandekên zayend û jimarê dighêjin wan .

Wek :

- Min tiştêk nedît
- Ez tiştêkî nabînim .

Bi vê têtgehê cînavên nenas nav in . Lê ji hêla xebitandin û rola wan di warê hevoksaziyê de, ew cînav in, ji ber ku cihê navan digrin . Wek :

- Ez tiştêkî dixwazim .

Di vê mînakê de bêtîya “tiştêk” cînavêkî nenas e, cihê xwestêkeke nebinavkirî girtiye . Reng e ku ev xwestek govarek, pênuşek, kaxezek, yan jî tiştêkî dîtir be.

Em dizanin ku navên rût (bê nîşandek) tev nas in (pendî ne)() lê ku nîşandekên nenasînê “ek, in” dighêjin wan, ew nav dibin navînî nenas . Wek :

- Şagirt helbestê dixwîne
(Şagirtek helbestêkê dixwîne) . (Şagirt helbestan dixwînin)
(Şagirtin helbestinan dixwînin) . Lê cînavên nenas nakevin ber vê rêzan û destûra navan . Ev cînav di raweya rût de nenas in, dema ku nîşandekên nenasînê “ek, in” dighêjin wan, nenasîya wan kûrtir û tarîtir dîkin . Wek :

- Min kes nedît
(Min kesek nedît) .
(Min kesin nedîtin)
- Ez kesî nabînim
(Ez kesêkî nabînim)
(Ez kesinan nabînim) .

Bo vê taybetmendiya nependiyê jî, navê vî beşê cînavan bûye “Cînavên Nenas” .

Dom heye...

Terorîst di qabê huner de



Karîkator: Astiyag

Fermandeyê nû yê Spaha Quds yek ji cinayetkarên şer li Kurdistanê ye

Fermandeyê nû yê Spaha Quds ku bi fermana Elî Xamineyî rêberê rejîma Îranê hatiye danîn, û yekek ji wan cinayetkaraneye ku li şerê Rojhilata Kurdistanê, beşdarî kiribû û sedan Kurdî serkut kiribû.

Îsma'îl Qa'anî, fermandeyê nû yê Spaha Quds a terorîst, ku bi fermana rêberê rejîma Îranê ve hatiye danîn, yekek ji fermandehên cinayetkarer ê rejîmê ye ku, li şerê Rojhilata Kurdistanê di sala 1359'an de beşdarî kiribû, û gelek serkutkarî encam dabûn. Qa'anî, xelkê bajarê

Meşhedê ye û fermandehiyên cuda yên wekî femandê tîpa 66 a Îmam Riza û leşkera 5 a Nesir, hebûye û di şerê Îran û Îraqê de beşdarî kiribû, û demekî kurt cihgirê fermandeyê îtila'at û cihgirê paraştina îtila'ata Sitada hevpar a Spaha terorîst bûye, û di sala 1368'an de bû bi cihgirê Qasim silêmanî yê terorîst û di wê dawiyê de, bi fermana Xamineyî, rêberê rejîma Îranê wekî fermandeyê Spaha Quds a terorîst hate danîn.

Îsma'îl Qa'anî di sala 1393'nn de gotiye ku:



“Amerîka û Îsraîl ji wê hindê piçûktirin ku xwe li hember hêza leşkeriya Îranê bibînin”.

Navbirî, yekek ji wan terorêstên tûndajoye, ku di dema xwe de li Rojhilata Kurdistanê, sedan Kurd serkut kir û bi tepeserî û serkuta Kurdan giha desthilatdariyê.